JI NÛ VE TÊKETIN

Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

Ger hêwirîna we were redkirin ji ber sûcekî cezayî yê ku di kontrola paşxaneya we de derketiye holê, mafê we heye ku hûn kopiyeke kontrola paşxaneya xwe ya ku wan bi kar aniye, bigirin. Ji xwediyê xanî kopiyekê bixwazin da ku hûn bi temamî bibînin ka çi di qeydên we de hene.

Gelo mafê min ê sûdwergirtinê heye ji bo xaniyên giştî yên MDHA an ji kûpona Beşa 8an, heke qeydeke min a sûc hebe?

Tenê **du sûc** hene ku we **bi domdarî** ji xaniyên giştî yên MDHA an Beşa 8an **mehrûm** dihêlin:

1. **çêkirina metamfetamînê** di xaniyên subvansekirî de
2. her mehkûmiyeteke ku **heta hetayê bi qeyda sûcdariya cinsî** encam daye

Ger hûn ji bo xaniyên giştî yên MDHA an Beşa 8an hatibin redkirin ji ber rewşeke di qeyda we ya sûcdariyê de cih digire ji bilî van her du sûcan, **hûn dikarin** li gorî şert û mercên xwe yên taybet **îtîrazê li biryarê bikin.**

- Nameya redkirina xwe **bi nivîskî** bixwazin - ew ê talîmatên li ser çawaniya daxwazkirina **hevdîtineke nefermî bi îdareya xaniyan** re ji bo hûn karibin rewşa xwe rave bikin, hebin.
- Ger hebe, **delîlekê bînin** ku bide zanîn ku pirsgirêk çareser bûye - ji bo nimûneyan li beşa bê binêrin.

Lê gelo xaniyên taybet?

Xwediyên xaniyên taybet, ne xwedî heman qaîdeyên wekî yên xaniyên giştî an Beşa 8an in - ew dikarin serlêdana we red bikin ji ber **her sûcekî** di sicîla we de. Dema ku hûn serlêdana xaniyên taybet dikin, **amade bin ku rewşa xwe rave bikin** û **her delîlekî bi xwe re bînin** ku nîşan dide ku pirsgirêk çareser bûye. Hin cureyên delîlan dikarin ev bin:

Nameyên referansê ji kardêrê we an kesekî din ê ku piştgiriya we dike

Delîlên ku diyar dikin ku hûn bi **xizmetên piştgiriyê** yên wekî bernameyên jinûve-têketinê û dêran re **dixebitin**

Hemû **hûrguliyên** ku baweriya we û guherînên we yên wekî paşvegera dibistanê û xwebexşbûna we yên ku we ji wê demê ve kirî rave dikin

Hin sûc dikarin ji sicîla we ya edlî we werin rakirin.

Hûn dikarin serî lê bidin ku hin sûc ji sicîla we ya edlî werin **derxistin** an jêbirin. Di nav wan de sûcên ku **nehatine mehkûmkirin**, dozên ku qet nehatine **teqîbatkirin** û mehkûmiyetên ku hatine **betalkirin** jî cih digirin.

Herin **www.las.org** û pêlî **Reentry Screening Tool** bikin da ku hûn bizanin ka hûn guncav in ji bo jêbirinê.

LEGAL AID SOCIETY **(833) 837-HOME**

NHBA **KURDISH KURMANJI - Reentry (615) 701-7957**

AMAC **(615) 988-6460**

NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER

ROOFTOP NASHVILLE

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekîtiya Baroyan a Nashville Hispanîkê bikin. Di 5/24an de hat revizekirin.